Bi rê de, me Ehmed Huseynî danî mala dostê delal Mizgînê Gemo û biraziyê min ê ku wisa bi saetan bi me re bêdeng mabû, berê min da Amûdê. Bi rê de alên YPG û wêneyên şehîdan li her derê daliqandî dihatin dîtin. Ji berî Dêrikê ve, yekser piştî derbasbûna me û heta em gihîştin Amûdê bi dehan bendên kontrolê yên Asayîşan hebûn. Balkêş bû ku Asayişên ku min dîtin wê rojê hemû xortên ciwan û nûhatî bûn. Carekê tenê jî kesekî ji wan daxwaza dilê min bi cih nanî û pasaporta min ji min nexwest. Berî em bigihên Amûdê, min ji biraziyê xwe Bengîn pirsî:

- Bengîn, ev çima kesek me nasekinîne. Hema li me dinêrin û bi hurmetî ji me re dibêjin herin.

Bengîn wiha bersiv da:

- Ew li tirimpêlê dinêrin, dinêrin ku navê Amûdê li serê û ne xerîb e, yekser destûra me didin. Rewş ji bo tirimpêlên xerîb ne wiha ye.

Bi gihîştina Amûdê re şev ketibû erdê. Min xwişka xwe ya biçûk Salha, birayên xwe Ezîz û Ferhan dîtin. Xwişka min êdî xwedî mal bû û bi Menaf re, hevalê min ê dema xwendina Zanîngeha Helebê, zewicî bû. Birayê min êdî bûbû kalik. Zarokên ku ji berî pazdeh salan de min ew nedîtibûn bûbûn xort û keç, hinek ji wan jî bûbûn dê û bav. Wisa zarokên ku ew cara yekê ye ez wan dibînim hebûn. Ketina nav xwişk û bira û zarok û neviyên wan, piştî ewqase sal, hestine seyr di hundir min de şiyar kirin. Li malê şûna dê û bavê min pir xuyabû. Çavên min her gav li wan digeriyan. Her ji kêlîkekê min digot qey wê derî vebe û wê diya min yan bavê min têkeve derî û ez ê herim destê wan. Min xwe ji pêşwaziya wan re amade dikir, lê nehatin. Ji ber ku ew nehatin, roja din serê sibehê divabû ez herim cem wan. Min bawer nedikir ku bibe sibe û ez herim serdana wan. Min bêriya wan kiribû. Nizanim çima baweriyeke wiha bi min re hebû, ku ew ê pê bihisin ez hatime cem wan û ew jî li benda min in. Bû sibe, min berê xwe da mezelê Amûdê, min berê xwe da Girê Şermola yê ku ev pazdeh hezar salin di hundirê min de diherife û naqede.

Gotarên Weşandî Nerînên Xwediyê Xwe Ne

www.buyerperss.com
buyerperss buyerperss
buyerpersss@gmail.com
Whats App 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Mizgîn Hesko: Me Pir Yekîtî û Komele Hene.. Lê Tev Jî Laşê Lerizî Ne.. Pûç û Vala Ne

- Di her yekîtiyekê de ku ji sêsed kesî pêk tê, incax deh ji wan û bi rastî nivîskar bin.

Hevpeyvîn: Qadir Egîd

Mizgîn Hesko....dûrî helbestê û wêjeyê, kî ye?

Mizgîn xwedana dilekî mezin û fereh e. Rast e, ne ku bi hest û derûnê xwe bi tenê, lê belê bi civaka derdorê re bi gştî û tevî ku ew baş dizane ku di heman civakê de û mixabin kesên rastgo.....nayê hezkirin, ji ber ku civaka me kurdan meyldarê kesên melaq, şelaf û duriwî ye.

Mizgîn Hesko kebaniya mala xwe ye, dayîk û jin e, bi hemû erkên dayîktiyê û jinîtiyê bi kêfxweşî radibe, wê her û her berxwedaneke bê hempa şopandiye, da ku bikaribe bi erkên dayiktiyê, jinîtiyê û nivîsînê rabe, qelen û nirxê vê yekê jî ne hindik e!?

Berxwedan, bi wateya tekezkirina hayîna mirov bixwe ye. Hayîn ne di xwarin û têkliyên civakî bi tenê de ye.Hayîn mebest têkliyên bi xwezayê re ku pir bala Mizgîn Hesko dikşîne, di felsefeyê de ku ew ji xwendina wê têr nabe, di pirtûkan de ku ew ji xwendina Elektronî pir hez nake, bi wateya pirtûk di himbêza wê de bêhtir nêzîkî dil û hiş û xwezayê ye.

Belê hayîn ku ew li mûzîkê bi hemî zimanan guhdarî dike û giyanê xwe pê pak û rewa dike.

Dara ku qurmên wê di wê axê de belavbûyî ....dê li vir jî ti kulîlkan hilnegre.

- Çirûska helbestê kengî di dilê Mizgîn Hesko çirusî...?

Hîna li gundê Şelhûmiyê, di dema ku yekemîn çirawîsik ber bi jor ve ronî da, bi bîna axa wê re dema baran dibariya, bi werzên salê re, bi demsalên çinînê re, dema keç û lawan payîzok û heyranok digotin, bi dilokên xuro kurmancî ku berboliyan û xêlevaniyan dihûnandin, li serê girê gund, dema ku ew keça pênc, şeş salî li polikan digeriya.

Belê piştî wî çaxî û li Tirbespiyê min helbestên xwe yên yekemîn êdî ristibûn.

- We çima berê xwe da riya biyaniyê, li ser çûnê û destpêka jiyana li biyaniyê, nexasim ku ew kes nivîskar be baxive....?

Ber bi biyaniyê ve ...şikestina ber bi şikestineke mestir ve, welat dagirtî xêr û bêr bû, lê em jê bê par bûn....?

Ber bi biyaniyê ve, ango ji sawîrê ber bi xewnê ve û ji xewnê ber bi sawîrên tarîtir ve. Ez bixwe li derfeteke xwendinê digeriyam, min li vir xwend jî ...lê ew xendina ku min bi dest xist û Dibloma wê wergirt ne li gor daxwazên min bû...hîn li destekî digerim ku dergehekî bi dilê min, pencereyekê di zanîngehekê de bo min misor bike, ez bixwe hew dikarim li dergehan bixim.

Ber bi biyaniyê ve û ji bo kesê nivîskar...,ango dûrketina wî ji xwezayên yekem re, ji jêderên herî pîroz re, her kulîlkek di zemîna xwe de bîndar e, her darek di hinava xwe de, hemî sîma , reng, forma kulîlk û mêywên xwe hildigre, tevî ku em li vir in, lê qurmên me li wir, di wê zemînê de hişk û zuha nabin.

Erêêê....dara ku qurmên wê di wê axê de belavbûyî ....dê li vir jî ti kulîlkan hilnegre.

Mirov li vir û di salên pêşî de, tevî ku kor e, lê pir bi heyecan û kelgermî, jiyanê dişopîne....lê belê piştî salên dirêj ew bêhtir bêriya wir dike, bêhtir meyldarê wî nanê tenûrê û zerika dewê meşkê ye.

Ma me kengî li hev kiriye....? Ta ku em karekî wiha pîroz bidomînin....ev felekreşiya Kewên ribatê ye.

- Kesin hene ku Mizgîn ketî bi bandora wan û pê re di warê helbestê de bûn alîkar?

Di kelkela germa havînê de, piştî lûblûba min, PDK li sûriyê-Alpartî.... mamoste bavê Ciwan ku berpirsê min î rêxistinê bû ez û du keçên din fêrî tîpên kurdî kirin, lê mixabin tirs pir bû....em pê de neçûn...ev di warê ziman de, ji lewra ku xwedan talent bûm û pêdiviya min bi zimanê nivîsînê hebû, bi kotekî min xwe fêr kir.

Beriya ku bêm bi demekê min Seydayê Tirêj dît, lê civîna min li gel wî bi tenê katejimêrekê dom kir.Birayê min ta radeyekê alikariya min kir, lê ew jî dom nekir, ji ber ku wî jî berê xwe da welatên biyaniyê.

- Mizgîn bi zimanê Erebî nivîsandiye, çima....?

Her çendîn Kurdî zimanê me yê zikmakî bû, yê axaftina rojane bû lê min jî nedikarî bû pê binvîsim

Her weha pirtûkên kurdî ne dihatin dîtin, belê ew tabû bûn, ji lewra û di destpêkê de ez jî ketim bin bandora wî, lê Erebî giyanê min rehet nedikir... min xwe zû ji bin bandora wî derxist...bi bawerî îro nikarim beytekê bi tenê pê binvîsim, na ne ku nijadperest im, ew dûrî hest û nestên min e.

- Hûn beşdarî festîval û pêşbirkên helbestê bûne...?

Li Kurdistana Rojava qet na, di Tîrmeha sala 2012an de, li Duhokê yekîtiya nivîserên kurd û mamoste Hesen Silêvanî bi germî bi xêrhatina min kirin û şevek helbest xwendin ji min re amade kirin.

Li Elmaniya yê her sal ez beşdarî roja helbesta kurdî dibûm, ev bû du sal ew jî rawestiya...ma me kengî li hev kiriye....? Ta ku em karekî wiha pîroz bidomînin....ev felekreşiya Kewên ribatê ye.

- Ji bilî helbestê, hûn nivîsandinê di tu warî de dikin...?

Belê, ji bilî helbestê, ez carcarna gotarê dinvîsim. Ev demeke ku min dest bi nivîsîna Romanê kiriye...xuyaye ku helbest hew tîna min dişikîne...!?

Hela ka em binerin, pêdiviya nivîsîna Romanê bi demê heye....û ez û dem...?

- Wateya van gotinan li gel Mizgîn çi ne....helbest, evîn, stiran, berxwedan, Qamişlo, welat , jina şervan....?

Helbest: Di meşka zimên de, ew nîvişkê herî xweş û bi taam e.

Ew giyan e, hezkirin e..çi karê bê hezkirin be, dê qet berdewam nebe.

Evîn: Di pirtûka xwe ya dawî de, ber bi werzê hezkirinê ve, êdî nêzîkî tixûbên evînê dibim. Min hîn nasnameyeke guncaw jê re ne dîtiye.

Stiran: Bi wata mûzîk, Dengê Xwedawend e, mirov vexwendî jiyana dilpakiyê dike.

*Berxwedan: hayîn e, yê li ber xwe nede ne hêjayî jiyanê ye.

*Qamişlo: Di dilê min de Işq e, nizanim ta kengî ez ê bi agirê bêrîkirina wê bême sohtin.

*Welat: Hezkirin e, bê hezkirinê dê ti welat neyên avakirin.

*Jina şervan: Li seranseriya dîrokê jina kurd şervan bû, ev şêrejinên îro neviyên wê Dastanê ne.

Ahhhha Mizgîn Hesko jî jineke şervan e, bi pênûsa xwe , bi reng û şêwaza xwe şervaniyê dike.

- Helbesta kilasîk a kurdî te dikşîne, hûn jî kê re bêhtir dixwînin...?

Helbesta kilasîk, kaniya herî zelal e, li derdorê tême seyranan, hinekî xwe ji sirtiya nûjeniyê rehet dikim.... çarînên Baba Tahirê Uryan bala min dikşînin, Bilindgoya netewî di helbestên Xanî de hêjayî xwendin û lêkolînê ne, felsefeya işqê li ba Melayê Cezîrî pir balkêş e, belê ez bêhtir van kilasîkên me yên qedir giran dixwînim.

- Ta niha kela pênûsa Mizgîn li welatê xerîbiyê ji nivîsandinê têr bûye...?

Ku ew têr bibe , dê raweste jî.

- Nivîsên Mizgîn Hesko ji kê re ne...?

Ji xwezayê re ne, ji kulîlkan re, ji xwînerên helbesta kurmancî re ne, ji wê/wî kesî re ne ku birastî nirxê zimanê xwe dizan e û ne ji bo têrkirina zikê xwe lê yê giyanê xwe re jî dijî.

Helbestên min ....ji Hespekî bejî re ne, ku min divê li gel wî sînoran bibezînim û bighim mêrgên asoyê, lê dikim nakim, ew nayê kedikirin!

- Gelo weşanên li ser rûpelên Facebookê , qedrê nivîsîna helbestê kêm nake...?

Bi min belê û naye jî ...belê dema ku helbestvan, hewil bide li gor şert û mercên teknika bikaranîna Facebookê tev bigere, û helbestê bi çend beytên bê wate dorpêç bike, helbest xwe bi nivîskar dide nivîsîn, hewldana nivîsa wê, hewildana girovekirina wê li gor hin form û pîvanan ne bi tenê kêmkirine ji buhayê wê re, belê ev xwekuştin bixwe ye...? Helbesta ku bi şêwaza Hayîko be, dikar e li wir cî bigre û dê bihtir jî bête xwendin. Ez bixwe û bimebest hinekî xwe dûrî wan alavan dikim, lê Facebook û di dema îroyîn de, ji pêdiviyên karên hunerî ne, ew pencereyeke vekirî ye, helbestvan dikare tê de xwe bide ber tîrêjên rojê, belê çawa...?

Dema ku helbestvan yan jî hunermend bizanebûn wê derfetê bixe destê nivîsîn yan hunera xwe, ne ku nivîs û hunera xwe bixe destê wan alavan, helbesvan divê bi wêrkiyeke mezin bikaribe wan alavan bixe xizmeta nivîsên xwe.

Hêza ku niha Kurdistan Rojava kontrol dike, rê li ber rewşenbîran negre, divê riya rexneyê vekirî be.

- We ta niha çi xelat wergirtine...?

Ez bixwe dinvîsim û berdewam im, bi wateya ku ne li benda xelata me, xelata herî mezin ew e, rêz û hezkirina xwînerên helbesta kurdî ne.Ne li bendê bûm, lê du caran ez hatim xelatkirin:

Di Mijdara 2012-an de û bi helkeftina 28mîn koça dawî ya Seydayê Cigerxwîn, ez ji layê PDPKS Pêşverû ve / rêxistina Elmaiya yê ve hatim xelatkirin.

Di Cotmeha 2013an de, li Essenê / Elmaniya ji layê Hevbenda Nivîskar û Rojnamavanên kurd li Sûriyê.

- Li gor nerîna te sedem çi ne ku nivîskarên Rojavayê Kurdistanê di bin Sêwanekê de nacivin, tevî ku gelek yekîtî û komele, ji bo nivîskaran çêbûne...?

Piraniya nivîskaran girêdayî rêbazekê ne, ango me kurdan nivîskarên serbixwe nînin. Bi dîtina min divê ew ne girêdayî ti rexên siyasî bin, dikarin ji bo wan û pêkanîna karekî rewşenbîrî, yan neştimanperwerî alîkar bin. Divê nivîskar xwedan helwest û nerîn bin, yek bin da ku bikarîbin nexşeya netewî ciwan û qeşeng bikin.

Belê me pir yekîtî û komele hene, lê tev jî laşê lerizî ne, yan jî pûç û vala ne, çima ez vê yekê tînim ziman...? Ji ber ku di her yekîtiyekê de ku ji sêsed kesî pêk tê, incax deh ji wan û bi rastî nivîskar bin, hela navan bixwînin....van navên pir, ta kîjan radeyê nivîskar in, ta kîjan astê xwedan helwest û pirojeyên rewşenbîrî ne, çend berhem afirandine, bi kîjan rengê xwendinê ve mijûl in, aya ew nivîsên wan û tekez ji asoyên berfereh ve, çendîn nêzîk in.

Xwebînî, duriwêtî, parastina berjewendiyên takekesî, melaqtî, ardemdariya ku li ser dêmên xwe didin çêkirin, belê ma ev tiştên ku niha min ew li jor bilêv kirine, ne bes in. Ew kesayetiyên bi wî rengê dê çawa bi awayekî posîtîv, aqlane û durist bibin stûnên avahiyên rewşenbîrî yên xwedan yek helwest , yek binemal û yek nerîn.

- Di nerîna te de wêjeya kurdî û bi taybetî helbest di asteke saxlem de ye....?

Ta radeyekê û bi min asta wê ne nizm e, li hemberî ya cîhanê ew hîn pêkan tavêje, ji wan pêkan hin jî bilind û watedar in. Helbesta ne saxlem be, ji xwe her çendîn ku hebe jî dê pir nejî, xwînerên helbesta kurdî lew sed bin jî, lê asta her helbestvanekî û deqê wî dizane..Pir seyr e, ku hin xwe padîşahê helbesta post modernizmê dibînin, ev yek, gava ku em bizanibin ew wateya vê qunaxê qet nizane û ne jî xewndiye. Bi rengekî din, eger helbestvan di ser û hişê xwe de ne azad û têghiştî be, ew dê nikaribe helbesteke wiha jî binvîsîne.

- Pênûsa helbestvan û rewşenbîrên kurd bi erkê xwe yê netewî rabûye..?

Îro bi hezaran xelk koçber bûn, di deryayên kûr û bê binî de wer bûn, di rêgehên ber bi tariyê ve, bi sedan kesên windabûyî hene, rojane zarok temenê ahmeqiya bavan didin û hwd. Di destpêka wan bûyerên diltezîn de, min jî helbestên şoreşgerî nivîsîn, hin ji hevalên min nivîskar jî, bîstik bi bîstik bûyer dişopandin û helwest û nerîna xwe vekirî, bê tirs derdibirîn....îro em tev winda bûne, rola me pir qels û zîz e, ne bi tenê partiyên siyasî li hev nakin, rewşa nivîskaran dijwartir e, hîn ew nikarin bibin xwedan Insiyatîv ...ku pêşinyaran pêşkêşî wan rexên heyî bike.

Nivîskaran hewil nedaye ku di derbarê nirxên newewî de, yek bin mînak ....mijara alaya Kurdistanê. Mijara sirûda neştimanî, mijara cejna kurdî herî pîroz ... Newroz û mijar û mînak pir in.

Hîn di destpêka şoreşê de, rewşenbîr pir germbûn, hino hino ku şoreş ji nexşeya şoreşgerî dûr ket, nivîskar jî bêdeng ma, bê hêvî ma... Divê ew hêza ku niha Kurdistan Rojava kontrol dike, rê li ber rewşenbîran negre, divê riya rexneyê vekirî be.

- Xwendina te ji helbestên biyanî re çawa dinirxînin...?

Bê guman, bersivandina vê pirsê ne hesan e, nizanim ka ji kû destpê bikim.. Belê û ji mêj ve, çanda me ya devokî, di civat û şevbuhêrkan de dihate guhdarîkirin, me kurdan Baba Tahirê Uryan, Celale Xanim Loristanî, Melayê Cezîrî, Feqyê Teyran, Seydayê Xanî û hwd hebûn... lê şaheserên wan di dema xwe ya herî rastteqîn de nehatibûn nivîsîn, dibe ku hin jê hatibe nivîsîn, lê diyar e ku kes tunebû ku wan zêr nivîsan biparêz e û erşîf bike.

Ez bi xwe nikarim vê yekê bikim, wan navan bênim beramberî yên Rojavayî û Elmanan ku wan jî Guthe, Rilke, Nietzsce, Schiller, Wilhelm Buch, Heinrich Heine, Günter Gras hebû.

Belê rast e, me helbesta nûjen heye.... ta kîjan radeyê em kurd tevgera nûjeniyê nas dikin ku ew bixwe şoreşeke ramanî bû, li Rojava hîna ji sedsala 19- an de, helbesta nûjen bi saya serê tevgera Modernizmê hatibû avakirin, ew ê tevgerê hemî hêmanên kevin, formên kilasîk bezandibûn.... li ba me Xweda navend bû lê li ba Modernizmê mirov navend e. Li ba me û ji mêj ve tîrêjên felsefê ronahî dabûn, û bi riya Tasewifê , êdî hin ji helbestvanên me, hin mijar tanîn holê, Nivîskarên Rojava mîna Nietzsche mufa ji nerîn û felsefeya ola Zardeştî wergirtibû.

Lê û mînak Elmanan bêhtir bi wêrekî derbasî felsefeyê bûbûn. Dema me ya îroyîn û gava em li helbesta Elmanî binerin yan jî romana wan binirxînin em dibînin ku mijarên ew li ser wan dinvîsin bêhtir mijarên Tawan, Romantîk, piskolojî ne, dema em romanên Charollote Link bixînin em dibînin ku wê xanimê her û her xwestiye di derbarê êşên pisologî û derûnî de binvîse.

Bi wateya ku ewan eger felsefe nivîsîbin ji me kûrtir in, eger evîn ristibin ji me wêrektir in, eger xweza anîbin zimên, ji me bêhtir rêz û qîmetê didin wê xwezayê, û wiha .

Kurd, hîna ne serbixwe ne, hîna bê dewlet in, bê dewlet bûn kambaxiya herî mezin û dijwar e... Lê ev xelkên/ miletên ku em di nava wan de dijîn ...hîna ji mêj de xwedan dewlet in, dikarin bi rehetî binvîsin û biramin.

- Berhemên we yên çapkirî û destnivîs çi ne...?

Ta niha min şeş berhemên çapkirî hene, bi gştî helbest in:- Tîpên Evînê.....2007. Asoyek Tijî Endeko 2008. Di Nav Henasên Kovanan De2010. Li Ber Pala Welatekî Birîndar Diherikîm2012. Ristek Lale2013.

Ber Bi Wrzê Hezkirinê Ve.....2015. Destnivîs jî ev in:- Sebeta Şekir, helbest ji bo zarokan, hîn bidawî nebûye. Hirçê Qeşayê Yê Piçûk Ber Bi Kû Ve.....çîrok...wergerandin ji Elmanî. Nimêjên Bêdengiyê.....helbest. Hin destnivîsên bi Erebî yê dema destpêkê.

Wê kengî Mizgîn welêt...?

Erê....Mizgîn bi canê xwe dûrî welat e, lê bîreweriya /giyana wê hîn li wir e, li Til Ziwan e ...ba meşka pîrka wê, ba pezê kalkê wê, sihara sibêdeyên Şelhûmiyê, leylan û rewrewka Tirbespiyê, kolanên evînê li Qamişlo û dê çî dî ew helbestvana /jina / dayika xemcivîn bibêje.

Weger: tekez dê rojekê ew vegerê,...bi hêviya ku ew veger û sefer ne di Darbestekê de be...!

- Gotina dawî di derbarê helbestê de...?

Helbest mîna evîn û felsefeyê ye bi peyv û gotinan nayê şîrovekirin, ew pêpelûka herî jor ji zimên e, her çendîn mirov bihilkişe nagihe dawî. Dema afrandina helbestê demeke cuda ye, tevî ku helbestvan wê demê dighê ber textê xwedawendan, lê ew peyamber dimîne.

Xweda ...bi riya peyamberên xwe xwestiye ku rêgihên hezkirinê li ber mirovan veke.

Helbest ...rastteqîn û rastgoyî ye, yê van mercan bi cî neke, dêmek bê hest dinvîse û xelkê dixapîne.

www.buyerperss.com
buyerperss buyerperss
buyerpersss@gmail.com
Whats App 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Di Riya Koçberiyê De (2-4)

Silêman Azer

2-Ya didiwan çênabe tu kes çixarê bikşîne û agirekî bi rê de vêxe, tu di ber xwe de hêdîka dibêjî ev ji her tiştî pîstir e, tu yê ku tutinê dixwî ne dikşînî, çawa tu yê bikaribî bi xwe.
3- Sisê telefon divê venebin û bêdeng bin, û çênabe heger çi çêbibe tu wê bikar bînî, û ji xwe ta bi kuxik û pişikandinê jî çênabe, baş e.
4- Ya dawî û herî giring rêberê we bêje we bimrin divê win bimrin, û li kîjan cihî ku we dengê fişekan kir divê her yek di cihê xwe de rûne û destên xwe deyne ser serê xwe, û bi carekê nelebite, û ev rê win bi qaçaxî lê didin, ne riya dê û bavê me ye, û çi bi serê we were ne gunehê me ye, rast e me ji we re got me rê kiriye lê em nizanin çi li pêşiya we ye. Bi van gotinên dawî, piştî ku wan seyan armiya kerî misoger kir, bi dizika vekeşiyan û ew radestî wî rêberî kirin, libkên koçberan di tayên tariyê re derbas bûn, û ristek ber bi tiliyên nediyariyê ve hatin kişandin. Ez nizanim gereke em spasiya wan qaçaxçiyan bikin, an em nifretan li wan bikin, em yên ku bidestê xwe em xwe radestî wan dikin, mal û milkên xwe difiroşin da em wan têxin devê van kesan, ku bi tenê ew te bi wan pereyan dipîvin, ango tu hêja yî çend hezar Euro, an Dolar, ji bilî wilo çarenûsa te ne ji wan re derd e, û heger bê ya dawî ew dibêje te: Yabo ma min xwe biqurbanî te kiriye ta tu ji welatê xwe koçber bibî, ev tişt karê min e û ez nikarim xema te bixum û hêsiran li ser te bibarînim. Gelo qey birastî şev kor e û cihan ji hev dernaxe, bi tenê ew nexşeyên xwe dike û em rengên tayên wê hildibijêrin, û em kirasê wê lê dikin, heger spî, reş, an rengîn be. Bêdengî bi tenê ji xişxişa gavên wan koçberan di nav pelên darên payîzê de ditengije. Serê wan ber xwe ve diçimîne û hewl dide ku bibe hevparê wan çirokan, yên ku xwe bi bendewariyê pêçane. Gelo ev qas tarîbûn di ku de bû, tevî ku dunya sayî ye û heyv nû ye jî, lê himbizbûna wan daran piştrast in bi reşê, û belkî ew jî matmayî ne ji van kesmên ku yekem car bê destûr êrîşî şahînşahiya wan dikin, piştî sed salî ku van qûnaxan kesm û bîna mirovan jibîrkiriye, piştî şerê di navbera dewleta Osmanî û Bulgaristanê de, van daristanan gelek şewat û bîna biraştina laşên mirovan bin ax kiriye, û dorpêçkirina bajarê Edirneyê di rûpelên dîrokê de mohir kirin, lê ji wê demê de yekem care ku hînî mirovan dibin, bi taybetî koçberên Sûriyê. Bêguman gelek tiştan ji hev re dibêjin bêyî ku wan koçberan agahdar bikin, û gelek çirokan jî vedişêrin.

Roja Zimanê Dayikê

« Yek bi zimanê xwe nizanibe şerm e, lê ji vê jî meztir sosreta mezintirîn ew e ku; ji ber zimanê xwe şerm bike...»

M. Burhan Hedbî

21ê Sibatê roja Zimanê Dayikê ya Navneteweyî ye. "21ê Sibatê ji aliyê Rêxistina Perwerde, Zanist û Çandê ya Neteweyên Yekbûyî ve di sala 1999an de weke Roja Zimanê Dayikê ya Navneteweyî hat qebûlkirin...
Armancên vê rojê ev in:
- Balkişandina ser mafê perwerdeya zimanê zikmakî.
- Bilindkirina têgihiştinan ji bo civakeke pirçandî.
- Bilindkirina toleransan li hember mirovên cihêreng.
Ev roj her sal li seranserê cîhanê bi çalakiyên pirrengî tê pîrozkirin. Di van salên dawî de kurd jî hêdî hêdî vê rojê pîroz dikin û balê dikşînin ser mafê perwerdeya bi zimanê zikmakî."
Ziman gelekî girîng e. Loma Celadet Bedirxan jî dibêje ku; "Miletên bindest heyîna xwe ji serdestên xwe bi du tiştan, bi qeweta du çekan diparêzin. Dîn yek, ziman dudu. Lê heke dînê miletên serdest û bindest yek be, hingê çek dimîne yek, ew jî ziman e."
Ez bi xwe ne ji hêla wan kesên yekalî li mijar û babetan dinêrin. Xweda, pir dengî, pir rengî û pir zimanî gerandiye ji nîşanên meznahiya Xwe û gotiye: "Afirandina asîmanan û erdê,(ji hev) cudabûna ziman û rengên we, ji nîşanên (Meznahiya Qudreta) Xweda ye. Bêguman di vê de ji bo zanayan ders û îbret hene. 30/22".
Belê, kesek bi çiqas zimanan bizanibe baş e. Lê divê pir rengî nebe sedema dûrketina ji rengê wî. Hin kes hene xwe mecbûr dibînin ku bi zimanê biyaniyan bizanibin, lê xwe mecbûr nabînin ku fêrî zimanê dayika xwe bibin û qaşo welatparêzin. Yek bi zimanê xwe nizanibe şerm e, lê ji vê jî meztir sosreta mezintirîn ew e ku; ji ber zimanê xwe şerm bike...
Digel ziman wiha girînge jî lê hîn jî hin kes di vê babetê de ne têgihiştîne û tenê di rojên wiha ango; rojên taybet de bi weşandina peyaman pîroz dikin. Hin kes jî dibêjin ku: " Ji kerema xwe, ji bo xatirê ku îroj roja zimanê zikmakî ye bila îroj her kes bi zimanê dayika xwe biaxife û binivîse." Hûn dizanin ku ev tê çi wateyê: Wek yek bibêje; di salê de yek roj roja evîndara ye û îroj ew roja evîndara ye "Sevgililer Günü"; bila her kes tenê vê rojê ji hev hez bike.
Divê weke hemû mijaran, di vê mijarê de ango; mijara zimên de jî, em ifrat û tefrîtê nekin û helwest di vir de jî parastin be!
Bi hêviya zimanê zikmakî bi şêweyek azad bibe navenda jiyanê da jiyan bibe jiyan û rê li ber şer û şerxwazan were girtin; roja zimanê zikmakî ya Kurd, Tirk, Ereb, Faris û hemû neteweyan pîroz be.

ÇAND (2-3)

Shahînê Bekirê Soreklî

Hema navên mit û keskahî û pincara ku di nav 50 salên borîn de, bi encama berfirehbûna çandiniyê û sedemên din wenda bûnî bide ber çav, û babetên hinek lawirên li Kurdistanê nemanî.
Bêyî guman, li gellek beşên cîhanê guhertinên mezin yên xwe bi Çandê ve girê didin cîh girtine, lê li hinek welatan dîroka çandî hatiye parastin û Çanda neteweyî di gellek waran de zindî maye. Em nikarin bibêjin ku tevahiya egera neparastina dîroka çandî li nik Kurdan xwe tenê bi bindestbûna wan û welatê wan ve girê dide. Li Asyayê û Afrîkayê netewene hene ku ji mêj ve xwedan dewlet in, lê li nik wan jî parastina dîroka çandî hema-hema tune. Li milê din, li welatekî wek Îrlendeyê ku bi sedan sal tê de îrlendî bindest bûne û heta gellekan ji wan nema bi îrlendî axaftine, dîroka wan ya çandî ta radeyeke bilind maye. Bi dîtina min, egerên herî grîng yên wendabûna şopên dîroka çandî li nik Kurdan xwe bi hinek sedeman ve girê didin û du sedemên grîng ji wan ev in: 1, Kurd bi xwe bi pirranî nexwende bûne û 2, dewletên desthilatdariya Kurdistanê kirinî bi xwe ji şaristaniyeke ramyariye bilind û baweriyên adelmendiyeke mirovahî dûr bûne. Di zimeanekî wek zimanê tirkî de peyva ku ji bo Çandê dihêt bikarhanîn, kültür, peyveke biyanî ye. Di zimanê erebî de peyvên "theqafe" yan "hedare" ku li şûna Çandê dihên bikarhanîn xwebêja durist ya peyva înglizî "Culture" yan ya almanî "Kultur" nadin... (reh: peyva latînî "cultura" – wek "kultûra" dihêt xwendin -).
Çanda Kurdan yeke devokî bûye û hîn îroj jî ta radeyeke bilind û di gellek waran de di nav Kurmancan de her weha dimîne. Çanda ku nehêt nivîsandin û qeydkirin nikare bi sedan sal zindî û resen bimîne. Di nav Kurdan de bi milyonan "têkoşerên siyasî" û şervan hebûne, û hene, lê gelo di nav milyonan ji wan de, ji demên par bigir ta îroj, çend kes hebûne ku xwe bi arşîvkirina tiştên derbarê Çandê de, qeydkirina têbiniyên derbarê Çandê de, û nivîsandina li ser Çandê mijûl kiribin? Ew berhemên ku çend ciwanmêran li ser Çandê nivîsandine jî, gelo çend Kurdan hay ji wan hebin! Ya rast berhemên derbarê Çanda Kurdan de hatinî nivîsandin bi pirranî ji aliyê çend biyaniyan ve di sedsalên borîn de hatibûne nivîsandine. Gelê kurd û rêxistinên siyasî yên vî gelî bi pirranî derbarê parastina Çandê û misogerkirina ku naveroka Çanda neteweyî dê bo nifşên sibe û dusibe, bi kêmasî bi nivîs û belgeh, di qalibekî resen de bimîne bêyî haydarî, zanistî û tecrûbe ne. Eger îroj biyaniyek ji me bipirse "Çortan li Kurdistanê çawa dihêt/ dihat çêkirin?" Gelo çend pirtûk di dest me de hebin ku em bikaribin tê de bersîva pirsa wî bibînin? Û çêkirina kelpîçan, tepikan, xaliyan, kulavan, babetên xwarin û vexwarinê... li nik Kurdên demên par? Û gelo çend Kurdên bakurî derbarê Çanda di nav Kurdên rojhilatî de haydar bin? Û gelo çend Kurdên rojhilatî derbarê jiyana Kurdên binxetê de haydar bin? Em behsa hebûna neteweya kurdî dikin û hemî kêmasiyên xwe dixin stuyê recîmên dîktator, ku ne bêyî tawan in, lê gelo çend Kurd bikaribin hema straneke ji beşekî din ji zaroyên xwe re bistrên? Fermo li ser taxeke şûna tu lê ji çend Kurdan re bibêje: Ji rindiya xwe ji min re piçekî behsa Çanda Kurdan bike. Hêvîdar im bersîvên wan hêviyê di dilê te xwendevanê hêja de vejîne!
Milletekî nexwende kujerê Çanda xwe ye, çimkî Çand çiqa dewlemend be jî, bêyî xwendin û nivîsandin dê zûdereng ji xwe wenda bike, têkeve bin bandora çandên din; û li milê din, çandên din ê ji naveroka çanda nexwendeyan bibin û bikin ya xwe. Lewma gerîna li çareyên parastina çandê bo Kurmancên îroj ji durishma "Bijî Kurdistan" gellekî grîngtir e. Çima? Ji ber ku çanda Kurdan hebe, Kurd nemir in, lê Kurdistana bêyî çanda kurdî bênerx e!
Kurdan pêdivî ne tenê bi fêrbûna xwendin û nivîsandinê heye, lê her weha çandina erf û toreya xwendinê di nav xwe de. Ger Kurd xusetê xwendinê di xwe de bi cîh nekin û nebe xwendevanê bi zimanê xwe, nivîskarên berhamçak jî di nav wan de pirr nabin. Ger xwendevan zêde nebin firotina berheman jî cîh nagire, û ta roja ku nivîskar nikaribe xwe bi pereyên firotina berhemên xwe xwedî bike, ew ê nikaribe hejmareke ber bi çav ji berhemên baş jî biafirîne. Û ta hunermend nikaribe jiyaneke xweş bi saya berhemên xwe bijî, ew ê nikaribe gellek berhemên çake hunerî jî bo xelkê xwe misoger bike. Di rewşa îroj ya kambax de nivîskarê kurd ne ku tenê bêpere dinivîsîne, lê bi ser de bizava weşandina berhemekê bo nivîskarê kurd carine bi îhanetê dagirtî ye. Bi encama va rewşa li pêş çavan Kurd dibin xwediyên stranbêjine ku heta bi navên CD'yên wan be jî şaş dihên nivîsandin, ku heta stranên wan yên gelêrî jî dihên şaşo-maşokirin û zimanê wan yê mayî bi telafuzeke neqenc dihêt brînkirin.

Serm û Şerm

« Berî ku ji mal derkeve destê xwe diavêt bêrîka çakêtê bavê xwe yê dalqandî. Dengê ku ji wan perê hesinî dihat, rehek ji orta dilê min diqetand, zingîniya wan heta roja dî li ber guhê min dima».

Qadir Egîd

Min -şagirtê hişmendçavên hingivî diguvaşt, ji piçkên tirsa di qorzîkan de dalqandî maye paqij dikir... Du tiştan ez pûç kiribûm; serma navê û şerma bêrîkê. Her du jî yekserm û yekşerm in....!
Sermê di wê tarîtiyê de tîrên xwe berdidan laşê min, wî jî bêçar qulikên çermê xwe ji wan re vedikir, bê berxwedan pêşwaziya leşkerên wê dikir, û keleha xwe di dest wan de berdida. Bi destê sibeha re xwe ji wî dagîrî azad dikir.
Lê şerma bêrîkê, derman jê re tune bû. Sedemên wê jî yek tenê bû; tunebûn.
Ez li deverekê tenê bi vê êşê hest dibûm; dema ez sibehan diçûm dûv hevalê xwe yê dibistanê. Rewşa wan a aborî pir xweş bû. Hedan li agirê sopa wan tune bû, ne bi şev û ne bi roj. Bi derbasbûna oda wan xwîn ji nû ve di hemû damarên laşê min de -Piştî tînê dida wan-xweş digeriya. Bavê wî ji min dixwest ez nêzîkî sopê bibim, min nedixwest, ez bi wê tîna ji dûr ve li rûyê min dixist kêfxweş dibûm, ew besî serê min bû..!
Hevalê min taştêya xwe bi payebûn berdewam dikir, her diranekî wî rengek xwarin dixwar. Qeymax, penêr, hêkê qelandî, zeytûn, hêkê kelandî û şîr. Hilma van cureyan xwe berdida kûrahiya nava min ya sar. Nava ku ji bilî îsotê kesidandî û zatera bê zeyt xwarina wisa tu car di hundirê xwe de nedîtiye.
Dema hevalên min taştiya xwe diqedand, diya wî çenteyê wî jê re tev dadigirt, mozek dixist kêleka pirtûkan de. Ew bi dengekî nizm şîret dikir:
- "Dûv re hindekî bide hevalê xwe ha; guneh e..!"
Hevalê min serê xwe ji diya xwe re dihejand, lê şîreta wê li ber avê diçû.
Her roj ev şîret bû, her roj hevalê min pêk nedianî û her roj min fehêt dikir ku ez ji diya wî re bêjim.
Berî ku ji mal derkeve destê xwe diavêt bêrîka çakêtê bavê xwe yê dalqandî. Dengê ku ji wan perê hesinî dihat, rehek ji orta dilê min diqetand, zingîniya wan heta roja dî li ber guhê min dima. Min çiqas dixwest rojekê destê xwe bixim bêrîka wî çakêtê daliqandî û kêlîkekê tiliyên xwe di nav wan pera de bibim û bînim, bê ku ez ji wan bibim.
Destxistina nav wan jî ji min re xewn bû..!

www.buyerperss.com
buyerperss buyerperss
buyerpersss@gmail.com
Whats App 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Bîstikek Guneh

Wêneya Bergê: Rşîd Hesso
Hesso – art
www.hesso.de
Çapa Yekem: Şam - Tirmeh 2006



BÎSTIKEK GUNEH
BÎSTIKEK XWÊ

Xwezî bi vê bîstka ku
a niha ji temenê min
bardike
Xwezî bi te wê kêlîka
kewên xwe firandin nêçîra gunehan
Dîsa xwezî bi te
kêlîka kewên te
bi barek xwê
barek guneh
vegeriyan bênderan
Xwezî bi min
îro
Ne guneh rojya min dişkînin
Ne xwê….

Ji Başûr Rojavayê Kurdistanê bajarokê Girkê Legê ye di slal 1970 ji dayik bûye.

Xweliya min tevnede

Heger te ne sar be
xweliya min tevnede
Ditirsim vemirim
Ditirsim
destên te li min sarbibin
û careke din
neyêm dadan....!!

***

Heger tu ne rêwî be
xweliya min tevnede
fincana min dernexûnî neke
dibe neyêm xwendin
dibe rêyên falê
li te asê bibin
û tu venegere...

***

Ku li mirina min nagerî
Ku bawer nakî
xwelî bûm
bûm xwelî
Xweliya min tevnede
ditirsim
ez bim...!!

Sersala genim

Bûkên baranê
Hîna keçikbûn
Li asmanê gundê me
hespên xwe girêdidan
Berê sibê
li ser cogan bûn
mij basko dikirin
û kewên xwe difirandin nêçîra bayê
Ayînên çandin û çinînê
bi ser bênderan de didêran..
Ku serê xwe radikirin
mîna qeşayê diçirisîn memikên wan
Ku serê xwe radikirin
mîna tavsorkê li ba dibûn guliyên wan..!!
Hina digot
Keça heyvê ye
salê carekê tiliyên xwe hine dike
bazinên dayika xwe didize diçe newrozê...!!
Hina digot:
keça xwedê ye
Rojên çarşeman
memikên xwe dide tavê
yan keziyên xwe bi axa sor dişo
Lê..
Yên ku genim kedî dikirin
ji kesî re negotin
Bûkên baranê ne
hîna keçikin
li asmanê gundê me
Hespên xwe girêdane
Wê sibê bi rêkevin

DESTNIVÎS

1
Li şûna pêşgotinê

Dereng bû
Çaxê tu li kuştina xwe mukir hatî
Û ez jî li
newêrekiya
xwe.....
.....

2
(.....)

Tê dîsa bê
Mîna cara pêşîn
Bi tena tariyê
Çaxê ku deriyên fediyê
Xilmaşin
Û deriyên min yên xewsivik
Pişta xwe dane dîwaran
Tê dîsa bê
û ezê
mîna cara pêşîn
bi tena tariyê
carekê bi bawişkîna
pêpelûkên di bin lingên te yên xwas de
carekê bi bêhna tariya
ji porên te dibarî
ji xew..
nê....
hilçenim.....

3
Zembîlfiroş

Şevên havînê xewsivikin
janên poşmaniyê
Mîna hilma tariyê
Mîna xwîna kuştiyekî tîrin
Tîrên dilbijokiya te
mîna pezkoviyekî çiyayî kujdarin
Xatûn
Şevên havînê xewsivikin
.....

Berhevoka xwe ya yekemîn bi navê (KEZÎZER)li Bêrûtê ji weşanxaneya AMERDA sala 2002an de weşand.

4
Xatûn

Tenahî şikefta peyambera ye.
Tenahî şevbuhêrka helbestvana ye.
Ne ew be jî
meyxaneya şeyda û evîndara ye.
Tenahiya min perestgeha gunehkara ye.
Lê tenahiya te
paytexta newêreka ye...
Zembîlfiroş
Tenahiya
te
paytexta
newêreka
ye.....

Berhevoka wî ya diwemîn bi navê (Bîstikek Guneh) di tîrmeha 2006 de li Şamê hate weşandin.

Çend Nameyên Kurmancî ji Neviya Salarê Xwînî re

1
havîn hîna ter bû

Havîn hîna ter bû,
li peravên Deriya sipî.
Ji xwe havîneke biyanî bû,
mîna xwêya li ser eniyên me diçirisî.
Bayê biyaniyê li te nedihat
Nejî cilên bajêr....
.....
Tu ne bi tenê dihatî, carê, kêlîkên me xwe ji çavan didizî
Bi te re birek zeriyên çiyayî, mîna zarokên dibistanê, xwe fêrî hejmartina teliyên min dikirin.
Birek bêrîvanên koçer, bi guman, bêdengiya min didan sondê.
.....
Tu ne bi tenê bû carê...
Bi dengê kenê te yê bilind re hezar gundiyan, bi cilên kurmancî,
xwe berdidan kolanên Beyrûtê...
.....
Bayê bajêr li te nedihat
Ne jî bê dengiya min....
.....
Nameyên ku – qaşo- bi Erebî bûn
Hevokên te yên nîvhûnayî
Awirên nîvço
Liva destên te
Porên te ku te bîrnedibir
ji ser çavên xwe bide alî
Qerf û henekên te... û
hemû diyariyên te
li min nedihatin
nejî xwêya li ser eniya te diçirisî
zuha dikirin....
Lê
havîn hîna ter bû
ji xwe havîneke biyanî bû,
mîna xwêya li ser eniyên me diçirisî...
.....

2
Sîha şevên kurt, pişta axê hênik nedikirin

Ne demsala barînê bû
û nizanim ew berf ji kîjan serdemê ve
bi ser memikên te de dibariya...
.....
Di perestgeha xwedawendên te de
hînî vexwarina helbestên mê bûm..
piyala şîr ji destên min nakeve
û şagirtên min
dawiya havînê
di mestek tirî de...
dimeyên.....
.....
Wê şeva havînî, laşê te yê şahîk, bi kurmancî xwê dida
Û ahînên te ji ferhenga Çiyayê Kurmênc bûn....

Rojnivîsk

1
ji mêj, ji ber wê pencerê ranebûme...
li wir nimêj dikim, qehweya xwe vedixum, cejna dayika xwe pîroz dikim, , mêvanên xwe pêşwazî dikim...
li wir şoreşa xwe li dardixim, biserdikevim, bibindikevim....
li wir, dawiya şevê, bi jinekê re radizêm.... û ..
li wir....
ji mêj dixwazim xwe vexwînim şevbuhêrkekê
lê
nexwiyame!!
... ji mêj

2
Dîwar ji min tije bûne,
dikin ber bavêjin..!!

3
Hayê wan jê tineye....
Ez neha di tariyê de diçim mêvandarî
Di tariyê de,
çaxê ku ez û wan mîna hev, bêreng, xwiyadikin....
Ez êdî ne wekî wanim
Wan bi gunehên min neşewitînin..!!

Li girkêlegê çêbûm, li wir mezinbûm, di 20 saliya xwe de li pey şopa azadî, welat û şoreşê ji gund derketim.

4
Berê, berî bîstikekê, min carê tiştek ji xemla dayika xwe diyarî wan dikir...
Îro, berî bîstikekê, çaxê ez pêrgî berhevoka xwe ya yekemîn bûm..
Hemû,
hemû helbestên min,
bê bazin,
bê xizêm,
bê guharên dayika min bûn...

5
ji newrozê re çar roj mane.
Rêwiyên ji wê hêlê ve tên,
wêneya Siyanîd ê li xwe kirine, dibêjin,
ji duh ve şahî lidarxistine,
..... li wir

6
Ku min bêriya welat dikir
min helbesetke xwe fêrî siwariyê dikir
bi rim û mertal dikir
ber bi çiyê ve rêdikir.
Îro, ku min bêriya welat kir
tenê li ber helbesta xwe ya yekemîn diketim....

7
wê salê
welat serê xortekî
ji gundê me
xwar.....!!
...

8
keçek ji gundê me
dil kete çiyê..

9
wê salê
çiyê hezkiriyên xwe
dixwarin.....!!

10
nekû ji berîka min ketibû yan min li şûna xwe jibîr kiribû,
dibe yek ji we bixwîne.... ez jî bibihîsim,
bawer bikim,
ne xewn bû..

11
her ku têm xewna te
dibînim ku helbesteke min di hembêza te de
razaye....!

12
Wê kengî memikên te biwerivin.
Ev berf
di nav lêvên min de
ji
xewa
ket..!!
.....

13
Ji mêj
dixwazim carekê derkevim nêçîra bayê
Ku li xwe digerim cixareya xwe vemirînim
yan awirên xwe ji ser fincana qehwê vekişînim
Ku li xwe digerim xwe vexwînim
kolanên aware û şevbuhêrka baran û heriyê,
nexwiyame…
nexwiyame û nizanim ji kengî ve
min ev derî li ser piştê vekirî hiştiye û çûme.
Vaye ez hîna li virim
ji ber vê pencerê ranebûme
dixwazim carek derkevim nêçîra bayê
lê nexwiyame…!

KEMAL NECIM

bîstikek guneh

çaxê ku havîn hîna ter bû

www.buyerperss.com
buyerperss buyerperss
buyerpersss@gmail.com
Whats App 00905368908545

bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Hunermenda Awstralî Ji Bo Alan û Hemû Cangoriyên Penabertiyê Stranek Çêkir

Stranbêjeke Awstralî ya bi navê Misi Higins, li ser Alan Kurdî yê 3 salî, ku sala bûrî di Deryaya Îcê de binav bubû stranek çêkiriye.

Stranbêj Misi Hising straneke li ser vî zarokê kurd amade kir û bi çavên bavê wî Abdullah Kurdî şîrove kir. Starana bi navê 'Oh Canada' bi klîpeke anîmasyonî tê pêşkêşkirin û wêneyên, ku zarokên penaber xêz kirine jî tê de têne nîşandan.

Hesing li ser strana xwe got:" Dema ez li mala xwe, bi kêfxweşî ligel zaroka xwe rûniştî bûm, min ew wêneyên xemgîn dîtin û min ji xwe re got, dibû ku ew zaroka min ba. Wê kêlîkê, hestekî giran ê parastinê bo wî û hemû kesên weke wî, ez guvaştim".

Li ser navê strana xwe (Oh Canada "Keneda") Hesing got:" Canada ew e, her cihekî ku kesên weke Kurdî parastina xwe lê dibînin. (Oh Canada) tenê çîrokekê vedibêje".

Li gorî jêderan, derhatên vê stranê dê ji bo çareserkirina pirsgirêkên penaberan werin bikaranîn.

Peyva wendayî

Peyva wendayî ji 5 tîpa pêktê, paşnavê helbestvanê Kurd, xwedanê sirûda netewî.

b	z	Y	T	E	d	a	l	e	C
î	û	û	H	E	s	e	k	ê	Ü
g	n	y	K	Z	a	z	a	k	î
u	n	A	e	E	z	a	r	ş	C
l	a	D	R	r	l	d	o	e	O
a	s	Ü	M	O	p	e	i	v	M
n	o	R	S	E	s	i	ş	î	E
k	u	R	M	A	n	c	r	n	r
b	ê	B	U	H	a	r	e	ê	D
t	ş	E	D	A	r	e	z	z	S

Zazakî – bûyerpirês – zû – soranî – comerd – zeradeşt – ez – kurmanc – şevîn – gulan – bêbuhar – celadet – dûr – aso – keleş – do – zar - hesekê.

Birîtanî Dizên Otêlan e.

Li Gorî Vekolîna Rojnameya "Telegraph" Pêkanî, 69% Ji Welatiyên Birîtaniya Pejirandin Ku Tişt Ji Otêlên Derveyî Welat Dizîne.

Di Serê Lîsteyê De Dismal Hatin Bi Rêjeya 68% Ji Kesên Vekolîn Li Ser Wan Hat Pêkanîn, Di Asta Duyem De Pîlên Rêbirîna "Remote Control" Û Lempeyan Bi Rêjeya 57%, Herwiha 51% Govanî Dan Ku Zwarin Ji Wan Otêlan Dizîne, Û Hejmarekê Ji Kesan Gorin Ku Xwarin Dixistin Nav Nan Û Ji Xwaringehên Otêlan Dibirin.

Lê Ji Tiştên Cuda Yên Xelkê Ji Otêlan Dizîn Û Govaniya Wan Dan Bi Rêjeya 27% Perdê Pencereyên Odeyan Bûn, Herwiha 7% Gotin Ku Incîl Ji Odeyên Xwe Birin.

Asoyî:

1-Cejna navbera du salan.
2-Xanî çêkir.
3-Giyayekî bînxweş, dengdêrine dirêj.
4-Navê gulekê.
5-
6-Ji çemê Diclê re tê gotin.
7-Xala li rû, beyreq (vajî).
8-Ji neyîniyê re (vajî), ev roj.

Sitûnî:

1-Tersî germ, term
2-Heskirin, ji nîşankirinê re.
3-Ji bo hînkirinê.
4-ka rê (belawela).
5-Ji bo vedana kon û girêdana ajelan, bran ji wan tê.
6-Agir, riz (belawela).
7-Bi lez (vajî), daçek (vajî).

	1	2	3	4	5	6	7	8
1						■		
2				■			■	
3						■		
4	■							■
5		■		■	■		■	
6								
7				■		■		
8			■				■	